



## Hesp û Cotyar



## Ew kûçkê direwî fîlî

Rojekê fîlekê mezin bi dûv xwedanê xwe ketibû û bi rêyeka xwe diçûn, kûçkekê biçûk hat û rewiyê û xwe li dora hilavê û qebê wî xwest.

Îna xudanê fîlî gotê: "Were kûçkol Te divê şerrê fîlê min bikî? Ezê dibînim tu gelekê direwî û fîlî hay ji te nîne."

Îna kûçkî bersiva wî da: "Ka here ser rêyeka xwe Mamol! Ez nehatîme şerrê fîlî bikim. Ez yê dirrewim da ku xelk bêjin: Berê xwe bidene vî kûçkê biçûk çendê bicerg û azaye û ji vî zirrefîlî natirse!"

**Çirokî: İvan Kirilov**

**Wergêran: Mûeyed Teyib**

Pişî cotyarî zevîya xwe kêlayî, dest havête û tovê xwe pê werkir. Li wêvetir çavê hespekî lê bû ku yê cehî bi axê wer dike, îna di dilê xwe da got: "Dibêjin mirov gelekê jî e û xwedê ji hemû zîdewerên dinyayê baqiltirê dayî.

Berê xwe bidenê yê çawa cehî bi axê wer dike.

Ma heger ew ceh daba min yan vê canîka li dev min rawesiyayî yan mirîşkên xwe baştir nebû?

Berê xwe bidenê ka dînek jî vê dike ya ew dike?"

Roj hatin û çûn. Ceh şîn bû, paşî zer bû, cotyarî dirî û wê zivistanê hemûyê bû alfê wî hespî.



© Mûeyed Teyib

